

Miks li her dewra dîroka tê zanîn de bajarekê giringê li herêmê bûye. Dema Împaratoriya Roma'ya Rohilatî de wekî Cizîrê, navendekê leşkeriyê giringtirînê li ser sînore Roma'yê li rohilatê bûye. Wê demê herêm bi navê "Eyaleta Moxoene" hatiye qeyd kirin ku navê Miks'ê ji xwe wê navê tê. Miks, piştî Roma'yê jî bajarekê giring bûye. Hebûna madena hesin a li herêmê û çemê Miksê ku şaxekê çemê Dicle'ye, tesîrekê mezin û erênî li ser jiyana û avahiya li Miksê kiriye.

Miks ne tine warê erdnasî de, her wisa warê çand û hunerê de jî, xala yekbûna herêma Hekkarî û ya Botan bûye. Ji ber wê qasê, di dîrokê de, di gel her du herêman warê siyasî, bazirganî, çand û hunerê de têkilî û danûstandin pêk aniye. Dema meriv avahiya Miks'ê a xwemal û serbixwe dinêre û lédikole, têkilî, raydan û danûstandinên navbera wan herêman de dibîne.

Taybetiya Miks'ê ya mezin a warê çand û hunerê de ewe ku, tevî cîranbûna wan her du herêman, ku her du jî çand û hunera Kurdî de xwedî cihekê bilindin, çand û hunerekê xweser kariye saz bike. Miks, di gel mîrê navdar Mîr Hesên'ê Welî, warê zanistî û perwerverdehiyê de, li herêmê, sazûmana medreseyan rakiriyê radeyekê bilind û bi rûmet ku sedan salan bûye bajarekê navenda zanistiyê. Warê wêje û edebiyatê de jî bi hozanê nemir Feqiyê Teyran, saziya xwe a çand û hunerî bi rewşekê xweser avakiriyê û ew sazûmana hunerî kariye bigihîne sedsalên paşê de.

DEMA OSMANIYAN DE MIKS

Di destpêka sedsala 16. dema Yavûz Selim li ser textê padişahiya Osmanî rûdine û berê artêşên xwe dide milê rohilatê, xuya dike ku, li herêma Kurdistan'ê Mîrekatiyên Kurd mîna Miks, Mahmûdî (Mihemdan), Hekkarî, Bitlîs, Hîzan, Botan û çendê din ku hejmara wan 30'a zêdeye, bi rewşekê serbixwe ava ne û li ser pêyanin.


Wan deman li Îran'ê dewleta Safewî xwedî hikme û bi hevkarîya eşîrên Tirkmenên Şîî (alewî) tesîra xwe a li ser Anatoliyayê robozê zêde kiriye. Ev rastî sedemekê wîye ku dewleta Osmanî berê xwe daye rohilatê û navbera her du hêzên mezinên wê demê şer û têkoşîn destpê kiriye. Di nav wê rewşa tarî û xirab, wargehên Mîrekên Kurdan pir caran bûye qada şerê her du dewletan ku Kurd jî bi mecbûrî tev li wan şeran bûne. Bi dawiyê diyare ku Mîrên Kurdan alê Osmaniyan girtine. Di bin alîgiriya Kurdan de hewl û xebatên alimê Kurd Idrîsê Bitlîsî rolekê mezin wergirtiye. Her wisa tê zanîn ku awayê mezhebên olî ve, sunnîbûna Osmaniyan û Kurdan li ser hevkarîya wan xwedî tesîrekê mezin bûye.

Idrîs'ê Bitlîsî di navbera Mîrên Kurdan û Osmaniyan de xebata navçîftiyê kiriye û di encamê de di bin sîstema "di nav xwe de xweserî"yê Mîrên Kurdan û Osmanî hevanîne. Bi peyman û fermanan ev yek hatiye qeyd kirin û pejirandin. Bi wê rengê hevalbendiya Osmanî û Mîrek^n Kurdan ava bûye.

Sala 1514'ê şerê Çaldîranê çêbûye, Safewî tîk çûne û encama wê şerê li ser siberoj û qedera herêmê rolekê mezin wergirtiye. Wê çaxê Mîrê Miksê Evdal Beg'e. Destjêkêşana Safewiyan a ji wanê bi demekê zû de çênebûye ta ku 25'ê Tebaxa sala 1848'ê, ku Sultan Suleymanê Osmanî keleha Wanê ji Safewiyan hilandiye. Piştê wê demê Eyaleta Wanê hatiye damezrandin û Miks wekî Mîrekatiyekê Kurd pê re hatiye girêdan.

ŞEREFNAME Û MÎREKATIYA MIKSÊ

Agahiyên berfirehê derbarê wê demê em ji Şerefnam'ê hiltînin. Wekî tê zanîn ew behrem bi destê Mîrê Bitlîsê Şeref Xan di sala 1596'ê hatiye amadekirin. Gorî Şerefnamê binemala Mîrekên Miks, Hîzan û Spayêrt'ê yeke û ji keleha Bilîcan'a Xinis'ê hatine wê herêmê. Bi navê Dil, Bil û Bilîc sê bira bûne, birayê mezin li Hîzan, yê biçûk li Spayêrt û yê navîn jî li Miks'ê cih bûye. Şerefname derheqê riwayetekê din jî dike ku ew malbat bi hevkarî û hevpeymaniya Sutanên Selçûqiyîyan hatine li wê herêmê.



Derbarê binemala Mîrekên Miksê rayekê din jî heye ku tê gotin ew malbat şaxekê malbata Eyyubiyane û sala 1229'ê dema ku Harzemşahî bajarê Xelatê dagir dikan, jî wê derketine û berjêrê axa Miksê bûne. Rastiya binemala Mîrên Miksê çibe bila ew be, ya vebirî

û qet'î ewe ku Mîrekati pêşiya desthilatdariya Osmanîyan jî hebûye, ava û li ser piyan bûye.

Gorî Şerefnamê, piştî mirina Ebdal Beg, kurê wî Mîr Ahmed navê Mîrîtiyê hilandiyê. Kargerî û rêveberiya Mîr Ahmed di nav Gel, Mîrên cîran û li Dewleta Osmanî qenc û baş nehatiye dîtin. Navbera Mîr û cîranan robo ro teşqele, tevîhevî û şeran rû daye. Bi taybetî navbera wî û Mîrê Hekarî Zeynal Beg de xusumet û dilmanî derketiye. Navê birayê Mîr, Mîr Hesên bûye. Mîr Hesên sala 1553'ê di gel artêşa Osmanî çûye sefera Nehçîvan'ê û bi tîkariya xwe a şervaniyê navdaye. Navbera her du birayan jî naxweş bûye. Mîr Hesên bi alîkariya Zeynal Begê Hekarî çûye paytexta Osmanî û bi demekê Qesra Osmanîyan a li Stembol'ê de maye. Li ser fermana padîşaha bi tarîxa 17 Ca 963 (29.03.1556), devera Karkar'ê ji Miks'ê hatiye veqetandin û Mîr Hesên bûye Mîrê Karkar'ê.

Sala 1565'ê li ser hin pîrsgirêkan Mîr Ahmed bi emrê Huseyn Paşayê Waliyê Wanê tê tewqîf kirin û çend salan wekî girtiyekê li keleha Wanê de dimîne. Wê navberê de Mîr Hesên mîrîtiya Miks'ê jî kiriye. Mîr hesên ema mîrîtiya xwe de medreseyekê li Miksê ser navê xwe ava dike, xan û karwanserayân ji bo rêwing û bazirganan çêdike. Her wisa Mîr li ser navê xwe weqfekê jî li dar xistiye ku niha jî di nav gel de, xwedî navekê rêzdar û bi rûmete. Xebat û helwesta Mîr Hesên li herêmê ew qas bi qenc rû dide ku navê wî bi Mîr Hesênê Welî nemir dibe.

Piştî mirina her du biran, Rustem Beg dibe Mîrê Karkarê û Mîr Ebdalê II. Dibe Mîrê Miksê. Mîr Ebdalê II. yek ji 36 Mîrên Kurdane ku bi fermana Sultan Muradê III.'ê Osmanî ya bi tarîxa 23 Sefer 996 (22.01.1588)'ê ji bo sefera Îranê hatiye xwestin. Piştî Mîr Hesên neyarî û dilmaniya navbera malbatê berdewam bûye. Di wan tevîheviyan de tê xuya kirin ku Mîrên Hekariyan xwedî tesîrekê mezin bûne.

Mîr Ebdalê II. sala 1596'ê miriye û kurê wî Mîr Ahmed'ê II. dibe Mîrê Miksê. Li wê demê Mîr Hesênê II. jî Mîrê Karkar'ê bûye. Mîr Hesên'ê II. bi alîkariya Sînan Paşayê Waliyê Wanê êrîş bîriye li ser Miksê, di wê şerê de, Mîr Hesên II. hatiye kuştin. Li ser wan pêşketinan Karkar car jî Miksê ve hatiye girêdan û Mîr Ahmed II. mîrîtiya xwe dewam kiriye. Şerefnamê de piştê wê tarîxê agahiyek nîne.


HEKKARÎ Û MIKSÎ

Gorî arşivê Osmaniyan sala 1635'ê Mîrê Miksê Seyidxan Bege. Seyidxan Beg bigumanî kurê Mîr Ahmed'ê II.'e. Tê dîtin ku wê navberê Mîrê Hekariyan car jî li ser Miksê tevilhevî derxistine. Sala 1635'ê Mîr Îmameddînê Hekkarî, dema ku bi Osmaniyan re ji sefera Rewan'ê vedigere, berê xwe dide Miksê û dagir dike, divegire. Mîrê Miksê naşê bi şervanî Hekariyan dûr ke, berê xwe dide Diyarbekirê, diçe Ordîya Hûmayûn, bi alîkariya fermanarê Artêşa Osmanî ji paytextê fermanekê diderxîne ku Miks Mîrekatiya wî ye. Lê ew ferman li nik Mîr Îmadeddîn rû nabîne. Dawiyê Seyidxan Beg bi piştgiya Hesên Paşayê Waliyê Wanê êrişê dibe li ser Miksê, Hekkarî paşve dikêşin, ji herêm derdikevin. Mîr Îmadeddîn xwe dispêre keleha Bizek'ê, xwe xelas dike, lê Mîrîtiya xwe na. Ji ber ku piştê wê bûyerê Mîrîtiya Hekariyê dikeve destê Zeynal Begê Hekarî.

EWLIYA ÇELEBÎ Û MIKS

Seyyah û rojanenivîsê Osmanî yê navdar Ewliya Çelebî, sala 1655'ê hatiye li herêma Wanê. Çelebî, Miks wekî sancaqekê xweser binav kiriye lê neçûye li wê derê. Gorî Çelebî, tevî fermanên Osmaniyan, Mîren Miksê tev li şerê Melek Ahmed Paşa û Xan Ebdal'ê Bitlîsî nebûne. Ne aliyê Osmaniyan û ne jî aliyê Xan'ê serhildar girtine, helwestekê xweser û bêal nişandane.

Piştî Seyidxan Beg kurê wî Seyid Mehmed Beg bûye Mîrê Miksê. Wê navberê de, li herêmê car din tevilhevî derketine. Gorî nivîsnameya Waliyê Wanê a bi tarîxa 05 R 1088 (06.06.1677)'ê ku bo payitexta Osmanî hatiye şandin, zelamekê ji derveyê Miksê ku navê wî Mehmûd'e, êriş biriye li ser Miksê, wê şerê de, Mehmed Begê Mîrê Miksê hatiye kuştin. Mehmûd Miks xistiye di bin destê xwe.




Waliyê Wanê ji paytextê re gotiye ku Mîrîtî mafê kurê Mehmed Beg'ê ye ku ji vê em derdixin ku nesla Mehmed Beg'ê dewam kiriye. Lê mixabin ew nivîs behs nake ku, ka Mehmûd çi kese û bi çi awayê hatiye li ser Miksê. Ev yek niha tarî maye. Ya em dizanin piştî wê tarîxê heta ku sedsala 19. ku Eyyubxan Beg doza azadiyê dimeşîne, Hekkarî maye di bin hikmê Mîrên Hekariya de. Nêzî sed salan xweseriya Mîrekatiya Miksê nemaye.

Çend nişanên hebûna desthilatiya Mîrên Hekariyan li Miksê hene. Yek ji wan medreseya Arvas'ê ye ku bi alîkariyan hatiye avakirin. Medreseya Arvas piştî medreseya Mîr Hesên, xwedî navekê mezin bû li herêmê û heta dewra cumhuriyetê perwerdehî dewam kiriye. Medreseyekê din jî ya Enkincasê ye, lê bi navê wî bêtir em ti agahiyan lê nînin.


Nîşanekê din jî ewe ku peyvnamekê erdfirotinê ya li sala 1826'ê ye. Gorî wê peyvnameyê nîva gundê Norevas a Miksê ya sê kurên sêwîne. Feyzullah, Tahir û Kerîmxan binavîn û ji malbata Mîrên Hekariyan. Li ser wê peyvnamê ew her sê kur, hisseya xwe a liser gund firotine Xan Mehmûdê Mîrê Miksê. Ev yek jî delîlekê mezine bo rastiya hebûna Mîrên Hekariyan a li Miksê.

SEDSALA 19. Û SERHILDANA EYYUBXAN BEGÊ MIKSÎ

Destpêka salên 1800'ê li herêma Miksê bûyerên mezin ava bûne ku li ser dîrok û pêvajoya tevgera Kurdan a sed sala 19. xwedî xalekê giringin. Eyyubxan Begê ji malbata Mîrekên Miksê dijberê Mîrên Hekkarî û Botiyan doza serxwebûn û azadiyê destpê kiriye. Wê demê li herêma Miksê, li başûr heta navçeya Bêdar ketibû di bin hikmê Botiyan, Miks bi xwe jî destê Hekariyan de bû. Eyyubxan Beg bi tevgera azadiyê dîroka Miksê de perrekê nû vekirîye û zarûnesla wî bi navê Eyyubxanbegî hatine naskirin. Wê demê li Miksê çend şaxên malbata Mîrên Miksê wekî Zeynalbegî, Kelehî, Mîr Muhammedî jî hebûne, lê bi tevgera Eyyubxan Beg, Eyyubxanbegî bûne pêmavanê Mîrekatiya Miksê.



Eyyubxan Beg dora şerê azadiyê de bi Mîrekatiya Spayêrtê re hevkarî û hevpeymanî jî pêk aniye. Keça Eyyubxan Beg, Mîranete Xanim, di gel Mîrê Spayêrtê zewiciye. Mîranete Xanim avakerê Medreseya Taxê ya Spayêrtê ye ku zanayê pin binav jê derketine. Mîranete Xanim sala 1821'ê çûye li ser dilovaniya xwe.



Kavlên Medreseya Tax'ê - îro

Dema Eyyubxanbegê de doza serxwebûna Miksiyan encam nedaye. Piştî mirina wî, kurê wî Evdî Beg şerê azadiyê devam kiriye. Tê zanîn ku Miks bi çaxê Evdî Beg serxwebûna xwe destxistiye û bi wê awayê Evdî Beg, avakerê duyemînê Mîrekatiya Miksa xweser tê pejirandin. Piştê mirina Evdî Beg kurê wî yê mezin Şêxî Beg bûye Mîrê Miksê.

ŞÊXÎ BEG (.....-1821)

Diroka Mîrekatiya Miksê de Şêxî Beg cihekê giring û taybet digire. Jî ber ku çaxê Şêxî Beg de, diroka Miksê de cara yekeme ku Miksî hikmê xwe ber bi devre fireh kirine. Ew gava Şêxî Begê avêtî, mîrekên Miksê kirine xîmekê mezin di dîroka Kurdan a sed sala 19. de.

Şêxî Beg, şerê dijberê Hekariyan domandiye û berê hêzên xwe daye bakûr, Kavaş û Westan'a bajarê kevnareyê li delava başûra behra Wanê xistiye bin hikmê xwe. Ev yek bo Mîrê Hekariyan derbekê pir mezin û giran bûye. Tevgera Şêxî Begê hevdemê serhildana Derwêş Paşayê Waliyê Wanê ye û Şêxî Beg kêrekê ji wê serhildanê hilandiye. Ji ber ku Derwêş Paşa, hem bi dewletê ser hildabû û hem jî neyarê Mîrê Hekkarî Mustafa Beg bû. Gorî belgeyên Osmanî, navbera salên 1917 – 1919'ê Mustafa Begê Hekarî ji ber Paşa, ilticayê Şahê Îranê

bibû. Mîrê Miksê Şêxî Beg jî ji wê keys û fersendê bi hêsanî Kavaş û Westana Hekariyan ji wan standibû.


KUŞTINA ŞÊXÎ BEG

Her çiqas Derwêş Paşayê Wanî sala 1819'ê hatibe dardakirin û serhildana wî têk çûbe jî, Hekariyan disa nekarîne bi şervaniyê Mîrê Miksê têk bibin û Westan û Kavaş ji destê wî derêxin. Li ser wê yekê Hekariyan rêya dek û xapandinê şopandine. Wekî tê zanîn rêvebera navçeya Şax'ê ya Hekariyan Adîle Xanim bûye. Ku hin çavkaniyan de navê wê wekî Saadet Xanim hatiye nivîsîn. Saadet Xanim gaziye Mîrê Miksê re dişîne û pêşniyara zewicîna lê dike. Dilê Şêxî Begê jî wê pêşniyarê germ dibe, qebûl dike û bi xêlî û merivên xwe diçe keleha Şax'ê. Lê Adîle Xanim, Mîr xapandiye û sala 1821'ê Şêxî Begê Miksî bi destê çar mexînen xulamên Adîle Xanim, hatiye kuştin, laşê wî bircên kelehê hatiye avêtin.

MÎREKATIYA MIKSÊ DE DEWRA XAN MEHMÛD

Li ser kuştina Şêxî Begê a bi rêya dek û xapandinê, şîn û her wisa behit û kerhekê mezin têxe li Miksê. Eyyubxanbegî di keleha Miksê berhev dibin û Xan Mehmûd ji bo Mîrîtiyê tê hilbijartin. Xan Mehmûd dê piştê salan keleha Xoşebê a navdar vebigire û di nav Mîrên

Kurdan de bibe xwedî navekê giran.



Di nav arşivên Osmaniyan de nameyên derbarê Xan Mehmûd de yê pêştirîn ya sala 1825'ê ye. Tê de diyare ku, sala 1825'ê Xan Mehmûd li Westan keleha Hêşet'ê de bicihe. Mîrê Miksê nameya xwe a bi tarîxa 15 S 1241 (28.09.1825)'ê ya bi zimanê Farisî Galip Paşayê Waliyê Erzûrûmê re şandiye. Mîr tê de dibêje ku fermanberiya Dewleta Alî (Osmanî) dike û li herêmê tinê

serê xwe hemberê êrîşên Eceman (Îraniyan) berxwe dide. Xan Mehmûd ji Galip Paşa xwestiye ku waliyê Wan û Mûşê re ferman bide ku hemberê Eceman de piştgiriya wî bikin.

Dema em digihin sala 1827'ê tê diyar ku Mîrê Miksê Xan Mehmûd, Mîrê Hekariyê Nurullah Beg, yê Botan Mîr Seyfeddîn (kurapê Mîr Bedirxan, bavê Yezdanşêr), yê Muhmudiyan (Xoşeb-Mihemdan) Mehmed Emîn Beg'e.

SERHILDANA ISHAQ PAŞAYÊ WALIYÊ WANÊ Û XAN MEHMÛD

Tiştêkê pir balkêşe ku waliyên Wanê çend caran serêxwe hildane. Pêşiyê de Derwêş Paşa serhildabû û sala 1830'ê îcar Ishaq Paşa tevîhevî derxistiye. Gorî nameya Mehmed Emîn Paşayê Waliyê Mûşê ya Waliyê Erzûrûmê re şandî ku tarîxa wê 27 R 1246 (14.10.1830)'e derbarê serhildana paşayê Wanê û têkiliyên wî bi Mîrê Miksê de agahiyên berfireh dide.

Gorî nameya Mehmed Emîn Paşayê Mûşî, sala 1830'ê Ishaq Paşa ji Wanê tê rakirin û tayîna bajarê Qersê dibe, Timûr Paşa bi şûna wî bi Waliyê Wanê tê vebuhtin. Lê Ishaq Paşa vê yekê jî dil napejirîne, dema ku li ser rêya Qersê, bi alîgiriya Huseyn Axayê Zîlanî, serê xwe hildide û vedigere, êrîşê tîne li ser Wanê. Eşira Zîlan wê demê li Iranê dijî. Mehmed Emîn Paşa dikeve navbera meselê û Huseyn Axa qanî dike ku dest ji piştgiriya Ishaq Paşa berde.




Nameya Mehmed Emîn Paşa

Emîn Paşa serdikeve, Ishaq Paşa dimîne tinê û çareyê revîn û spartina ba Xan Mahmûd dibîne. Gorî nameya Mehmed Emîn Paşa, Ishaq Paşayê serhildar wê demê xwe spartiyê Xan Mahmûd û di keleha Miksê de ye. Her wisa li ser gaziya Xan Mahmûd eşîrên herêmê yê mezin wekî Şikakî, Takorî, Beravî, Omerî, Hanifî û Ertoşî bi leşker û şervanên xwe tèn li Miksê ba Xan Mahmûd cihê xwe digirin.

Xalekê balkêş jî ewe ku wê bûyerê de Nurullah Begê Hekarî û Xan Mahmûdê Miksî hevhatîne. Her du jî piştgiriya Ishaq Paşa dikin. Emîn Paşa dibêje ku Xan Mahmûd merivên xwe birêkirine ba wî ku ew jî destyekiya wan bike, lê qebûl nekiriye. Ishaq Paşa'yê Wanî demekê din çûye Hekariyê ba Nurullah Begê.

MIRÊ MIKSÊ Û KELEHA XOŞEB (MAHMÛDÎ)

Dema em digihin sala 1838'ê tê dîtin ku Mîrekên Miksê kelaha navdar a navenda Mirekatiya Mahmudiyan feth kirine û tevayê başûra Behra Wanê heta ku hidûdê Iranê xistine bin hikmê xwe de. Her wisa Xan Mahmûdê Mîrê Miksê wekî Bedirxan Begê Botî, Nurullah Begê Hekarî û Ismail Paşayê Amidyeyî bûye Mîrekê serekeyê Kurdistanê. Destxistina wî ya keleha Xosebê hêz û quwwetekê bê hempa dayê ku ev yek dinav nûsaf û nameyên paşayên



Keleha Xoseb'ê - îro

Osmaniyan de pîrr caran hatiye nivîsîn. Dewleta Osmanî, di gel dewra Sultan Mahmûdê II. Têkiliyên yê bi dewletên Ewropayê zêde kirine û li ser sazûmana xwe a îdarî û siyasî politikayekê nû pêşxistiye. Bingeha wê polîtîkayê yekdestkirina karên îdarî û siyasî û berhevkirina li paytextê ye. Yanî heta wê demê li Kurdistanê Mîrên

Kurdan herêmê xwe de serbixwe bûn, sîstema rêveberî destê wan de bû. Dewletê ji bilî hin şertan xwe tev li karê wan nedikir.

Pêwîstiyekê wê polîtîkayê jî ew bû ku Mîrekatiyên Kurdan ji holê werin rakirin. Ji ber ku Mîrekatiyên Kurdan yên serbixwe, astengiyekê mezin hemberê sazkirina sîstema Osmanî ya nû. Dê bi vê polîtîkayê Osmaniyan Mîrekati jî holê rakirina û şûna Mîrên Kurdan ji navendê, yanî ji paytextê qaimeqam an Walî bi awayekê fermî hatibana tayîn kirin.

Ew rastî, bû sedema şerê Mîrê Kurdan û Dewleta Alê Osmanî. Ji ber ku ittifaqa dewra Sultan Selim êdi dawî dibû. Hewcedariya Osmaniyan Mîrekatiyê Kurdan nemabû. Şerê Osmanî û Mîrên Kurdan sala 1834'ê destpê kir. Pêşîn Mîr Mehemedê Rewandizî bû armanca Ordîyên Osmaniyan. Piştî pela yekema sala 1834'ê pela duyem a êrişên ordiyên Osmaniyan li sala 1838 çêbû. Wê salê yek ji armanca tîrên ordiya Osmaniyan ji Xan Mehmûdê Mîrê Miskê bû. Xan Mehmûd li keleha Xoşebê kiribû navenda serokatiya xwe.

Li vê derê divê em behsa birayên Xan Mehmûd jî bikin. Wekî me pêşiyê de gotî piştî kuştina Şêxi Beg, Xan Mehmûd erka Mîrîtiyê hilandibû. Nav birayê Xan, bi taybetî Xan Ebdal xwedî cihekê mezin û giring bû ku feth kirin û idare kirina herêma Mahmûdî (Mihemdî)yan Xan Ebdal hewl mezin dabû û rolekê giring pêk anîbû. Xan Ebdal herêma Mihemdan da heta warê Ecem xwedî navekê bilind bû. Ji xwe Xan Mehmûd bêtir li Westan dirûnişt û birayê wî Xan Ebdal li keleha Xoşebê cih bibû. Ebdurrezzaq Beg ji di nav wan şer û hêzan de xwedî rolekê mezin bû.

Sala 1838'ê Muşîrê Erzûrûmê Osman Nûrî Paşa ji bo şikestandina hêza Xan Mehmûd hatibû tayîn kirin. Şertê payitextê ji Paşa ew bû ku li herêmê teşqeleyekê mezin dernekeve. Ji ber ku Xan Mehmûd li hidudê Iranê cih bibû û ev yek serê xwe ji Osmaniyan re talûke bû. Ji berk u Osmanî ji piştgiriya Iran û Mîrên Hekariyan pirr ditirsiyan. Wezîfekê Paşa jî ew bû ku dê teftîşa "Asakir-i Muntazama-i Hazret-i Şahae" bikira û hem jî çavnêriya muzakereyên sînorî yên navbera Osmanî û Iranê de, ku li bajarê Erzûrûmê pêk dihat, kiriya. Osman Nûrî Paşa derbarê Xan Mehmûd, birayê wî Xan Ebdal û keleha Xoşebê de gelkî nûsaf ji payitextê re nivîsîne. Yek ji wan de Paşa dibêje ku keleh destê Xan Mehmûd û Xan Ebdal'da ne û wisa didomîne;

"Keleha Xoşebê li ser zinarekê bilinde û ji çewsa bi hewanê nebe, wesiteyên rûxandinê yê mîna top û laximan kar nake. Heke, yek an du hezar kêse were xerckirin û pêwîst be ku bi pênc-şes hezar leşkeran ve êriş biçe ser wê kelehê, gorî çetûnî, zehmetî û bêkeysîya kelehê û gorî zayikirina zexireya wan heke dused mîr di kelehê de xwe bigirin, kêmtirîn şes mehan bi hewanê were çewsîn û were muhasara kirin, dibe ku destxistina kelehê wê mimkin bibe."


Payitexta Osmanî, ji Paşa pirs kiriye ku li sînorê Iranê ka bê şer û tevilhevî, destxistina Xan Mehmûd biderfet an nîne? Osman Nûrî Paşa nivîsa xwe ya bo bersîv a bi tarîxa 13 Ra 1254 (06.06.1838)'e de aloziya êrişekê li ser Xan Mehmûd wisa qise dike;

" Heke ji bo te'dîb kirina Xan Mehmûd bi awayê hêzî xebatek were avakirin, dibe ku ji Mîrê Hekariyan yê serhildar alîkariyê bixwaze û ew jî alîkariya wî bikin. Her wisa gotinên êla Kurdan li kirinên wan, û kirinên wan li gotinên wan nayê û nayê fam kirin ka çi mezhebê ne. Dema serê wan bikeve tengasiyekê çi alî be fermanberiyê dikin ku, ji ber wê, dê mêldariya aliyê Iranê bikin. Dê Iranî jî gorî mizacê xwe yê eşkere, dibe ku alîkariya veşartî an eşkere li wan bikin. Ji ber wê, dê koma wan zêde bibe û hel kirina û pêkanîna wê meselê hewcedarê hewldanekê mezin bibe"

Di wê navberê de Waliyê Wanê Ishaq Paşaye ku sala 1830'an serhildabû û xwe sipartibû Xan Mehmûd. Paşa piştî hindê hatibû efû kirin û car jî bo walîtiya Wanê hatibû tayîn kirin. Li ser wê yekê Xan û Paşa îcar dijminê hev bûn. Her çiqas Osman Nûri Paşa, nameya xwe de, gotibû dibe ku Mîrê Hekariyan piştgiriya Xan Mehmûd bike jî, rastî wisa derneketiye. Ji ber ku Mîrê Hekariyê Nurullah Beg û kurap û cihgirê Mîrê Cizîr Bedirxan Begê Mîr Seyfeddîn, li ser dijminahî û nevênîya navbera xwe da a kevnare ji nişgavê êrîş anîne li ser Xan Mehmûd, Mîrê Miksê li ser wan bûyeran mecbûr maye, birayê xwe Xan Ebdal bo muzakereyan di gel Osman Nûrî Paşa, şandiye bajarê Erzûrûmê. Osmanî gelki ji derba Mîrê Hekarî û Cizîrê ya li ser Xan Mehmûd dilxweş bûne. Ji ber ku ev pêşketin bûye sedema hilweşîna hêz û hewla Xan Mehmûdê serhildar. Ji name û nûsafên Osmaniyan tê derxistin ku di wê pêşketinê de Mişûrê Sêwasê Hafiz Paşa ku hevaltî û hevkarîya wî a bi Bedirxan Begê heye, rolekê mezin hilgirtiye û Mîrên Kurdan ji Hafiz Paşa cesaret rakirine ku êşîş birine li ser Xan Mehmûd. Xan Mehmûd wê dewrê qêma xwe li Îraniyan jî neaniye û mêldariya Ecem nekiriye. Mecbûr maye bi Osmaniyan re mûzakereyan. Mîrên Hekarî û yê Cizîrê gotine ku heta Xan Mehmûd teslimê Dewleta Osmanî nebe, dê paşve nevegerin û şerê bi Mîrê Miksê bidomînin. Xan Mehmûd bi wê rewşê dimîne navbera du agiran de. Hem bi Osmaniyan û hem bi Mîrên Hekarî û Botiyan re dikeve şer û berxwedanê.

Dewama wê pêvajoyê de berxwedana Xan Mehmûd şikestiye, Xan hatiye Wanê û dexaleta Ishaq Paşa kiriye û tê re çûye Erzûrûmê. Li dawiya sala 1838'ê Xan Mehmûd di gel birayên xwe Xan Ebdal, Ebdurezzaq Beg û Mîr Sêvdîn wekî girtiyekekê ji Erzûrûmê ba Derseadet'ê hatiye menfî kirin. Keleha Xoşebê bi destê Osmaniyan hatiye xâlî kirin û mufrezeyek leşkerê Osmanî tê de cih bûye.

Osman Nûrî Paşa her çiqas Xan Mehmûd bimenfî bo Dersaadetê şandibe jî, di nameyên xwe de dibêje ku Xan Mehmûd heke xwe bide alî dewletê dê li ser hidûdê Îranê bibe temînata ewlekariyê. Ji ber ku qadirê bindestkirin û rêveberiya eşîrên Kurdane û dikare li ber êrîşên Ecem berxwebide, wan bisekinîne. Osman Nûrî Paşa ji Derseadet'ê xwestiye ku dewlet bi Xan Mehmûd re peymanekê hevhatin û ittifaqê saz bike û Mîrê Miksê li Bâzîd'ê bi malbata xwe re cih bibe.



VEGERÎNA XAN MEHMUD Daxwaz û hêviyên Osman Paşa li Derseadet'ê hatine nirxandin û bi erênî hatiye dîtin. Di encamê de li sala 1939'ê li ser raveya erênî ya Mişûrê Sêwas'ê Hafiz Paşa, Xan Mehmûd û birayên wî, wekî Osmanî dibêjin "mezherê efûya âlî" bûne û cardin vegeyriyane li Kurdistanê. Her wisa

serdarî û karbidestiya wan a li herêmên, wekî Mahmûdî (Mihemdan), Akçaqale, Westan, Kavaş û Miks bi Osmaniyan jî bi hatiye pejirandin. Xan Mehmûd û birayên xwe Mîrîtiya xwe domandine.

Piştê hingê em dibînin ku Xan Mehmûd li qesra xwe ya li Kavaş de rûniştiye, birayê Xan Ebdal li keleha Setmanisê a li sînorê Îranê sekinîye. Keleha Xoşebê heta sala 1842'ê di bin

destê Waliyê Wanê bûye, sala 1842'ê birayê Mîr, Xan Ebdal, bi êrîşkê nîva şevê cardin keleh ji Osmaniyan standiye û kure xwe Mîr Muhammed kelehê de daye rûniştandin.

SERHILDANA MISR'Ê, TENZÎMAT Û REWŞA MÎREKAN

Wê navberê de serhildana Mehmed Alî Paşayê Kavalayî li Misirê mezin bibû. Sala 1839'ê artêşên Mirsî û Osmaniyan li Nîzîp'ê hatine hemberê hev, artêşa Osmanî ku Feld Mareşal Helmuth Von Moltkeyê Alman jî di qada fermanariyê de cih girtibû, têk çûbû. Sultan Mehmûdê II. hê ew agahî ne hilanî ji ber nexweşiya dikêşiya, jiyana xwe dest dabû.

Ew pêşketin û Fermana Tanzîmatê a navdar kû piştî wê şerê hatibû îlan kirin, li herêma Kurdistanê bibû tevîhevî û teşqeleyên nû. Bi taybetî patrîkê Nestûri Mar Şemûn kul i herêma Hekariyê de bû, bedkarî li bendên derbarê xeyrîmûslîman kiribû, û xebatên mîsyonerên Ingilîz û Frenkan li herêmê pêk anî, gelê Kurd û yê xeyrîmûslîm rakiribû hemberê hev.

Encamê herî girîngê wan pêşketinan bêguman tevgera li ser Nestûriyan a bi destê Mîrê Botan Mîr Bedirxan bû. Di rojeva Ewrûpayê de ew tevger û xebat wekî “komkujî-qetlîamê” dihat binavkirin û ev yek bibû sedemekê nû ku dewletên Ewrûpayî ji bo jiholêrakirin û ruxandina Mîrekatiyên Kurdan, li ser desthijlatiya Osmanî tesîr û bandora xwe zêde kiribûn.

Her çiqas polîtîkayên Osmanî ên pêşiya tenzîmatê de ruxandina Mîrekatiyan cih girtibe jî rewş û mercên nû ê piştî Tenzîmatê pêwîstiya wê xebatê zêdetir kiribû. Dema ku em digihin sala 1847'ê artêşên Osmanî ji bo wê xebatê berê xwe didin Mîrê Miksê Xan Mehmûd, birayên wî Xan Ebdal, Abdurezzak Beg, Derwêş Beg, Mîrê Botan Bedirxan Beg, Mîrê Hekariyan Nûrûllah Beg, Mîrê Xelatê Mustafa Beg, Mîrê Kêsan Xalid Beg.

Tê dîtî ku Xan Mehmûd piştî Tenzîmatê herêma bindestê xwe fireh kiriye û gelê bajarê Wanê ê di ber Tenzîmatê berxwedayî jî bûne piştgirê Mîr. Bi gorî nûsafên li arşîvê Osmaniyan Xan Mehmûd li bajarê Wanê Fazil Begê ji malbata Timûrpaşazadeyan wekî rêveberê Wanê vebûhtîye û bi hevhatina eşîr û Mîrekên li Xelat û Elcewazê, herêmên bakûra Behra Wanê jî xistiye di bin hikmê xwe.

Şerên navbera Osmanî û Mîrên Kurdan de gelkî xurt bûye û derbarê wan şeran de hezaran zêde pelik û nûsafên Osmaniyan hene ku ro bi ro hatine nivîsîn. Em li vir bi awayekê berirehî li serên naşên bisekinin. Di encama wan bûyeran de Fazil Begê Wanî, Nûrûllah Begê Hekarî û Xan Ebdalê Birayê Mîr ixanet li ittifaqa Mîrên Kurdan kirine û dexaletê alê Osmanî kirine. Nûrûllah Begê Hekarî bi rûtbeya Serdergehvaniya Dergahê Âlî hatiye xelatdan û bi midûrê Hekarî hatiye vebûhtin. Meha Tîrmeha sala 1847'ê berxwedana Mîran şikestiya û Xan Mehmûd û Bedirxan Beg teslîmê Osmaniyan bûne. Bedirxan Begê Botî bo girava Gîrît'ê, Xan Mehmûd bi bira û malbata xwe bo bajarê Rûşûk'a li Eyaleta Sîlîstreyê hatiye sirgûn kirin. Xan Ebdalê birayê Mîr her çiqas pêşiya şikestina berxwedanê dexaletê Osmaniyan kiribe jî, Osmaniyan ew xapandiye û ji sigûna digel Xan Mehmûd xelas nebûye. Xan Mehmûd piştî 19 salên di jiyana sirgûniyê, 4'ê Kanûna sala 1866'ê (22 Teşrînîsanî 1282) li bajarê Rûşûkê çûye li ser dilovaniya xwe. Malbata wî piştî sala 1878'ê kuş erê Osmanî û Rûsan çêdibû, icazet standine ku vegehin Stembolê.

Piştî sala 1847'ê Eyaleta Diyarbekir û navçe û herêmên wekî Wan, Muş, Hekarî, Cizîr-Botan û Mêrdîn di bin navê Eyaletê Kurdistan hatine yekkirin ku Miks wekî qezayekê li bajarê Wanê hatiye girêdan. Neviyê Şêxî Begê Miskî ku navê wî Ebdal Beg bû bi midûrê Miksê hatibû tayîn kirin. Ji ber wê yekê tevî sirgûnkirina Mîran, hêz û heyîniya malbata Mîrekên Miksê li Miksê berdewam kiriye.

Sala 1849'ê Nurullah Begê midûrê Hekariyê û Waliyê Kurdistanê Esad Paşa li hev nekirine û Nurullah Beg ilticayê Iranê kiriye. Li ser pêvajoya ku Şêx Tahayê Nêhrî rolekê giring tê de

hilandibû, meha Adar'a sala 1949'ê teslîmê hêzên Osmaniyan bûye û bo giraca Gîrîtê hatiye sirgûn kirin. Li heman dewrê de Ebdal Begê Mîrê Miksê jî bi Waliyê Eyaleta Kusdistanê hev nekiriye û piştî tevilhevî û hin şeran payiza 1849'ê li çiyayê Sarîbulax'ê Xavesorê teslim bûye û bo girava Rodos'ê hatiye sirgûn kirin.

Ji nivîs û nûsafên Osmaniyan ê bi tarîxa 04 Şaban 1270 (02.05.1854)'ê diyare ku Ebdal Beg di sala 1854'ê hatiye efû kirin, demekê di Artêşa Hûmayûna Dersaadet'ê Alaya sêyemîn de hatiye cih kirin, dû re icazeta vegeerîna welat wergirtiye û Miks û Kavaş'ê çend salan rêveberiya fermî kiriye.

Gorî tezkereya ku ji Wezaretê Malîyê bo muteserrifên Wan û Hekariyê re hatî şandin a bi tarîxa 21 Zilhicce 1277 (14.09.1861), Midûrê Qezaya Kavaşê Mehmed Axa, ji erk hatiye dûrxistin û Ebdal Begê ji Xanedana Miksê jî bo wê karê hatiye tayîn kirin. Hem Ebdal Beg û hem Derwêş Begê birayê Xan Mehmûd, bi alîkariya Seyid Tahayê Nêhrî ji sirgûnê filitî bibû, li Miksê rêveberiya fermî kirine û bi wê rewşê hebûn û hêza malbata Mîrekên Miksê li herêmê berdewam kiriye. Piştî Ebdal Beg û Derwêş Beg, malbatîyên Mîrekan li Miksê karbidestîya fermî hilnegirtine ta ku salên 1900'dan. Di destpêka salên 1900'an Miks wekî melbendekê (navçekê biçûk - nahiye) tê diyar û bi bajrê Wanê girêdayî ye. Li wê demê kurê Ebdal Begê Muhtila Beg midûrê Nahiyeya Miksê tê xuya kirin. Mihtila Beg bi edaleta rêveberî, kargerî û karbidestîya xwe û şexsiyeta xwe a mûstesna navekê mezin û giran di dîrokê de hiştiye ku nûha jî di nav civakê de navê wî bi rêzdarî û rûmetî têtin ziman.

Gorî tezkereya bi tarîxa 9 Zilkade 1320 (07.02.1903)'ê li ser pêşniyara waliyê Wanê Muhtila Beg wekî midûrê Nahiyeya Miks hatiye tayîn kirin. Rêveberiya Muhtila Begê a li ser edaletê hem dinav gel û hem jî li dewletê bi awayekê rêzdarî û pesndarî rû dîtiye. Muhtila Beg bi tezkereya bi tarîxa 04 Ra 1338 (27.11.1919)'ê bi destê Wezîrê Daxiliyê û Sedrazamê Osmanî bi nişanekê hatiye xelat kirin. Wergera wê tezkerê wiha ye;

“ji ber sêdaqat û xizmetên qencûbaş, xelat kirina Îsmail Axayê serokê eşîra Şikak bi payeya mecîdîye ya sêyemîn, û ji serokên eşîran Midûrê Nahiyeya Miksê û cihgirê qaymeqamê qezayê Kavaş Muhtila Beg bi payeya Osmanî ya Nişanê Zîşan a çaremîn rewa hatiye dîtin. Ji bo bikaranîna vê Iradeyê Seniye Wezîrê Daxiliyê karmende. 04 Ra 1338 (27.11.1919)”

pêşîya sazkirina Cumhuriyetê çûye li ser dilovaniya xwe. Muhtila Beg, sîlsîleya malbata Mîrekên Miksê de, bi xelqeya dawîn a klasîk tê zanîn. Malbatîyên jî Mîrekên Miksê hê jî li herêmê dijîn.

Sinan HAKAN

ÇAVKANIYAN

Arşîvên Dewletê ya Serokwezîrî, Serkariya Giştîya Arşîvên Osmaniyan

Ewliya Çelebî, Seyahatname

Şeref Xan, Şerefname

Feld Mareşal Helmuth Von Moltke, Nameyên Turkiye yê Moltke Weşanxaneyê Remzi 1999-Stembol

Cumhuriyeta Turkiye, Ansîklopediya Îslama Wezaretê Perwerdehiyê

Tarîxa Vak'anuvîs Ahmed Lutfî Efendî, Weqfa Tarîx, Weşanên Yapı Kredi 1999 – Stembol

Yrd. Doç. Dr. Mehmet TOP, Berhemên Mîmarî yê Mîrên Mahmûdiyan li Xoşebê, Cumhuriyeta Turkiye, Weşanên Wezaretê Çandî, Rêzeberhemên Hunerî/158